



DÎROKA REXNE YA EDEBÎ LI BAKÛRÊ KURDISTANÊ

Surood Weli Ismael Al-jaf¹, Rabeea Ismael Khalid ZEBARI²

1.College of Education – ibn Rushed for human science, University of Baghdad, Baghdad, Iraq ¹

2.College of Education – ibn Rushed for human science, University of Baghdad, Baghdad, Iraq

KURTE

Rexne ya edebî beşek ji zanistên edebî ye . Çendîn qonax û çax derbaskirine. Di her qonax û çaxekê de rexnegiran bi awayekî cûda serederî digel têksta edebî kirî ye. Roleke baş hebû ji bo pêşketina têkstên edebî. Çendîn teorî derketine holê. Derketina her teorîyekê ji bo sererastkirina şaşîyên teorîyên pêş xwe bû û li ser şaşîyên wan disekinî. Heta roja îro guhertin di rexne ya edebî de didomin.

Em ê di vê lêkolînê de dîroka rexne ya edebî li Bakûr, em ê behsa destpêka rexneya edebî li Bakûr bikin heta 2010an de. Helbet rexne ya edebî li Bakûr, li gorî parçeyên din bêhtir pêş ketîye. Çunkî kurdên li Iraqê bêhtir ji parçeyên din azadî ya nivîsandinê bi zimanê kurdî heye. Rexne ya edebî li Başûr, Li reh û kokên wê ji bo edebîyata kilasîk a kurdî vedgere. Melê Cizîrî dibe Yekemîn helbestvanê Kilasîk qala rexne ya edebî kiriye.

Peyvên Sereke : Rexne, Rexne ya Edebî, edebîyata kurdî, Dîroka Rexne ya Edebîyata Kurdî li Bakûrê Kurdistanê.

Abstract

Literary criticism is a branch of literature, Although several stages and times have been experienced , criticism at each stage and time is predominantly accompanied by literary text, A crucial role is indicated by the development of literary texts. It may be claimed that several theories have emerged for the development , and the output of each theory was to correct the errors of the previous theories and focus on their errors; hence , there has been a vivid change in the dominance of literary criticism since then.

In this study, we will discuss the history of literary criticism in the North, we will talk about the beginning of literary criticism in the North until 2010. Of course, literary criticism in the North has developed more than in other parts. Because the Kurds in Iraq have more freedom to write in the Kurdish language than in other parts. Literary criticism in the South turns to its roots for classical Kurdish literature. The first poet to talk about literary criticism is Mele Ciziri.

Keywords: Criticism , Literary Criticism , Kurdish literature , History of Kurdish Literary Criticism in the north of Kurdistan

Özet

Edebi eleştiri, edebiyatın bir dalıdır, Çeşitli aşamalar ve süreçlerin yaşanmasına rağmen, her aşamada ve zamanda eleştiriye ağırlıklı olarak

¹. Email: surood.weli@ircoedu.uobaghdad.edu.iq

edebi metin eşlik eder, Edebi metinlerin gelişimi önemli bir süreçtir. Gelişim için çeşitli teorilerin ortaya çıktığı ve her teorinin çıkışı önceki teorilerin hatalarını düzeltmek ve hatalarına odaklanmak olduğu iddia edilebilir, bu yüzden uzun süredir edebiyat eleştirisinin egemenliğinde canlı bir değişiklik olduğu düşünülmektedir.

Bu çalışmamızda Kuzey'de edebiyat eleştirisinin tarihini ele alacağız, Kuzey'de edebiyat eleştirisinin başlangıcından 2010 yılına kadar bahsedeceğiz. Elbette Kuzey'deki edebiyat eleştirisi diğer bölgelere göre daha fazla gelişmiştir. Çünkü Irak'taki Kürtler diğer bölgelere göre daha fazla Kürtçe yazma özgürlüğüne sahipler. Güneydeki edebiyat eleştirisi köklerine klasik Kürt edebiyatına döner. Edebiyat eleştirisinden bahseden ilk şair Mele Ciziri'dir.

Anahtar Kelimeler: Eleştiri , Edebî Eleştiri , Kürt Edebiyatı , Kuzey Kürdistan Kürt Edebiyatı Eleştiri Tarihi.

DESTPÊKT

1. Têgeha Rexne ya Edebî

Rexne ya edebî di nav edebîyata cîhanê de pir kevn e. Weke hinek zanistên din li Yewnanistanê bi awayekî sade destpêkirî ye. Paşan hêdî hêdî guhartin û pêşketin bi ser de hatine. Heta ku li ser destê feylesofê yewnanî “*Erîsto*” bi awayekî têorîk eşkere û berçav bû ye. Di wî çaxî de hinekan têgeha rexne yê weke şirovekirinek ji bo têksta edebî bikar anî ye. Her weha hinekên din têgeha rexneyê weke li gorî hinek pîverên civatî û rewîştî li rexneyê dinêrî. Bi vî awayî eşkere dibe têgeha rexne ya edebî ji wate û hizir û boçûnên sade destpêkirî ye. Paşan wate û ramanên berfirehtir û ji hev cuda û aliyên cudatir ji xwe re girtine. Di serdemên kevin de rexne weke dibistan û rê û rêbaz tune bû, belkî digel felsefeyê bû yan beşek bû ji felsefeyê re. Her ji çaxê Yewnanistanê ên kevin de rexne girêdayîbû bi felsefeyê re, lê belê di çaxê nû de rexne bêhtir girêdayîbû ji estetîkê re, ku leqek bû ji leqên felsefeyê re. Paşan rexne bi zanistên mirovî ve hat girêdan. Anku rexneyê sûd ji zanistên mirovî wergirt weke dîrok, psîkolojî û civatî û hwd. Îcar ji encamê vê yekê rexneya dîrokî, civakî û psîkolojî û hwd derketin holê (Salih, 2010: 6-7).

Rexne ya edebî ji çaxê kevin de hebû. Anku piştî despêkirin a berhemên edebî dikarin bibêjin rexne ya edebî weke pêwîstîyekê hat holê. Lê belê bi awayekî akademîk tune bû. Ji destpêkê de rexne ya edebî girêdayî hest û sozên mirovî bû, li hemberî bûyerên xweş û nexweş ên jiyanê de. Îcar ev yek bû eger ku mirov li gorî bîr û boçûnên xwe rexneyê bike (Ehmed, 2009:6). Pir guhertin li ser rexne ya edebî hatin encamdan, lê belê bi awayekî akademîk dîroka rexne ya edebî ji sê qonaxan re derbas bûye, her weke bi vî awayê jêrê: (Hamad, 2018: 1115)

1.1. Qonaxa Yekemîn: Rexne ya Kilasîkî

Ji rexne ya çaxê *Erîsto* û *Pilaton* re dihê gotin rexne ya kilasîkî (Cuqî, 2016: 25). Ev Qonax ji çaxê 18an de destpêdike. Di vî çaxî de ji bo şirovekirina berhemên edebî ji bal rexnegiran ve bi awayekî sereke giringî bi nivîskarî

dihê dan (Ebdulrehman, 2010:6). Anku bi awayekî din civat, dîrok, psîkolojî û jiyanname ya nivîskarî dikirin rêyek ji bo şirovekirina têksta edebî (Nihêlî, 2019: 73). Ev yek di teorîya dîrokî, civatî û psîkolojî de dihê dîtin (Qadir, 2009: 63). Rexne ya Kilasîk wan teorîyên rexneyê ji xwe re digire, ên ku giringî bi alîyê derveyî têkstê didin. Weke van egeran dîrokî, civatî, siyasî, aborî, jîngeh û psîkolojî hwd. Li gorî rexne ya kilasîk, rexnegir têksta edebî bi rengvedana van egerên navborî girêdide. Anku ew egerên bandor li nivîskarî kirine ku têkstê binivîsîne (Zebari, R.I.K & Babayiğit, 2021, r.54) (Îcar di vir de pêwîst e rexne ravekirin be, bêtî ku biryarê bide. Erkê rexnegir li vir ew e ku lêkolînê ji wan egeran bike, ên bandor li ser nivîskarî kirine ku berhemî binivîsîne. Her weha peywendîya nivîskarî bi têkstê û dewr û ber ve eşkere bike. Ev ji bo wê yekê ye, alîyên veşartî di têkstê de eşkere bikin. Bi ewê watayê ku têksta edebî rengvedana jiyana nivîskarî ye û hin caran têkst encamê serboriya nivîskarî ye digel ya civatê (Cuqî, 2016: 25). Her weha hin rexnegir wisa difikirin ku heta mirov ji têksta nivîskarî fêmbike pêwîst e ji nivîskarî fêmbike. Anku bi awayekî din pêwîst e şarezahî li ser jiyannameya nivîskarî bi awayekî giştî hebe heta bikare ji têkstê fêmbike (Warîn û Wêlik, 2008: 100). Li gorî Rexne ya Kilasîk rexnegir ji têkstê destpêdike û li ser naveroka têkstê disekine. Lê belê ji têkstê bi dawî nayê. Belkû ber bi alîyê derveyî têkstê diçûn û bi tinê berhem dikir xala destpêkê. Lê belê xala navend û dawî yê ji karê wan li dor nivîskarî yan jîngeh û rewşa nivîskarî bû (Cuqî, 2016: 26).

1.2. Qonaxa Duduyan: Rexne ya Modern

Ev qonax ji çaxê 20 an de destpêdike. Di vê qonaxê de guhertin di rexne ya edebî de hatinkirin, ku mirina nivîskarî ji bal *Rolan Barthes* ve hat ragihandin (Warîn û Wêlik, 2008: 77) Wate li cihê ku lêkolîn li ser nivîskarî bihê kirin, baştir dibe ku lêkolîn li ser xeber û têksta nivîskarî bihê kirin. Bi wê yekê ku têkst bi xwe canekî xweser e û cuda ye ji canê nivîskar. Her weke di teorîya Şêwazgerî, Binyadgerî, Formalîzm û hwd de eşkere dibe (Qadir, 2009: 63). Rexne ya modern têksta edebî weke sistemekê xweser û dîr ji nivîskarî datîne. Lêkolînê li ser esasê ziman û ciwanî ya wê dîkin. Ji her egereke derveyî têkstê dîr diêxin û giringî bi sistemekê têkstê didin. Di rexne ya modern de desthelata nivîskarî li ser têkstê namîne û mirina nivîskarî dihê ragihandin. (Hamad, 2024: 938) Îcar deskirina rexne ya modern ji bo sererastkirina rexne ya klasîkî bû. Çunkî lêkolînên rexne ya kilasîk ji edebiyatê dîr ketin. Li gorî rexne ya modern têksta edebî dikare wateyeke tam bide. Bêtî ku giringî bi alîyê derveyî têkstê bidin. Rexnegirên modern ji berhemê edebî destpêdikin û ji berhemê edebî bi dawî dihên. Çunkî li gorî boçûna wan, berhem bi xwe dikare nûneratîya xwe bike û xwe bi dest xwendinên hemereng û cuda cuda berde dîr ji nivîskarî û rewşa bergehê edebî tê de peyda bû yan ew jîngeha nivîskar tê de jiyayî (Cuqî, 2016: 27). Rexne ya modern li bin bandora teorîya zimanvanîya nû peyda bû. Penayê dibe ber zimanî bi ewê watayê, ku ziman sistemeke serekî ya têksta edebîye. Lewre

alîyên zimanî kirin esas ji bo lêkolînên xwe û peyv bi peyv vedikolin û giringî bi dubare xwendinê didin. Li gorî rexne ya modern dupatkirin yan tîpek bo çend caran dibe watayeka taybet bigihîne û alîyên veşartî eşkere bikin (Gerdî, 1974: 50). Rexnegir li ser esasê sîstema têkstê kar dike, lêkolîna xwe dike. Ev hemû hewldan ji bo wesif û şirovekirina têkstê ye. Ew tiştê girîng bawerî jê re heye xwe dûr kirine ji biryardanê. Çunkî biryardan xwendevan ji dubarexwendina têkstê dûr dike û hêza vedîtinê lawaz dike û dibe ew biryardana rexnegirî li ser têkstê şaş be (Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V, 2022, r.23)⁴. Rexnegir li gorî rexne ya modern li bersiva van pirsan digere weke berhemî tu mijar heye? Çima ev mijar heye? Çima mijareka din tune ye? Bi çi awayî qala mijara xwe kirîye? Çima bi awayekêî din qala mijara xwe nekirîye? û hwd. Ev ji wê yekê, ku têkst nûneratîya xwe dike û pêwîstî bi egerên dewrûber tune ye. Têkst senter e. Ji ewan teorîyên rexneyê yên lêkolîna xwe li ser têkstê bi xwe dikin. Ew jî: “ Formalîstên Rûs, Rexneya Nû, Binyadgerî, Simyolojî û hwd (Cuqî, 2016: 29).

1.3. Qonaxa Sêşeyan: Rexne ya Postmodern

Di vê qonaxê de bêhtir guhertin di rexne ya edebî de hatin holê. Çunkî nivîskar û têkst her du bi hev re hatin pişgohavêtin. Li cihê wan giringî bi xwendevanî hate dayîn. Wate xwendkar çawan têkstê dibîne wisa dixwîne û şirove dike (Ebdulrehman, 2014: 7). Ev yeke di Teorîya Helweşangerayî , Hêrmonotîk , Teorîya Wergirtinê û hwd eşkere dibe. Li gorî van teorîyên rexneyê têksta edebî her dema gihişte destê xwendkaran, wî çaxî nivîskarî tu mafek ji têkstê re tune ye (Cuqî, 2016:63). Di rexneya postmodern de wergir senter e(Zebari, R.I.K, husein.B.R,abduhman.L. M, ameen,S.T.M,(2022) R.128. Çunkî di karê rexneyê de eger kesek tune be têkstê bixwîne û şirove bike, wî çaxî têkstê tu giringî tune be. Giringî didin mewdayê bandora têkstê li ser wergirî û eşkerekirina peywendîya di nava wergirî û têkstê de dûr ji nivîskarê têkstê. Her weke ew dibêjin: “Xwendkar azad e bi çi awayî jê fêmbike û şirove bike.” Bi vî awayî têksta edebî xwendineka zatî ye. (Mahdi, Hamad, and Hameed, 2022: 190) Bi vî awayî têkst û wergir wate yê eşkeredikin. Çunkî wate bi tenê di nava hizir û bîrên xwendkar de tune ye. Belkû di nava xwendkaran de û têkstê de jî heye. Îcar li gorî çax û astê fêmkirin û paşxana xwendkarî de, xwendkar wateyên ji hev cuda ji têkstê re eşkeredike. Giringiya wê yekê eşkere bikin, ku cureyeke din a rexneyê heye, nakeve bin van her sê qonaxan de, Ew jî Rexneya Rewşenbîrî (Cultural Criticism) ye. Li gorî vê cure rexneyê wateya berhemê edebî eşkere nabe dûr ji civat û dîrokê(Zebari, R. I. K. & Babayiğit,V. (2022). R 105). Çunku edeb ji civak, dîrok û rewşenbîrî yê nahê cudakirin.

2. Dîroka Rexne ya Edebî Li Bakûrê Kurdistanê

Destpêka edebiyata kurdî weke her gelekê din ji edebî folklorî destpêdike(Mehemed, 1989, r. 160). Îcar ji bo vê yekê hin îşaretên rexneyî di gotinên *pêşyan*, *beyit*, *sitrân û serhatîyan* de eşkere dibin. Lê belê rexne li ser berhemê nivîsî di hê kirin. Lew re em nikarin wan îşaretên rexne weke

despêkek ji bo rexne ya edebî ya kurdî bi hesibînîn(Nihêllî, 2010, r.55). Di nava edeba nivîsî ya kurdan de rexne ya edebî ya kurdî dîrokek kevin heye. Çunku edeba kurdî xwedî dîrokek kevin ne. Li gorî vê yekê boçûnek heye û dibêje:

“ *Destpêkê berhemê edebî peyda dibe. Paşan rexne li ser wî berhemî di hê kirin. Anku serheldana rexne ya edebî di nava her gelekê de girêdayî bi serheldana edebiyata wî gelî ye. Anku bi awayekê din pêdivî ye li destpêkê berhemê edebî peyda bi be. Paşan rexne ya edebî li ser wî berhemî peyda dibe*”. (Nihêllî, 2010 , r.58)

Îcar li gorî vê yekê eşkere di be rexne di edebiyata kurdî de xwedî dîrokek kevin ne. Çunku edebiyat û berhemên edebî yên kurdî xwedî dîrokek kevnin, bo nimûne eger em berhemên Babe Tahîrê Hemedanî yekem têkista kurdî ya nivîsî weke destpêk bi hesibînîn, wê dîroka edebiyata kurdî ji bo pîtir ji 1000 salan bi zivire. Nemaze pêwîste wê yekê bizanîn ew şewazê hûnerî yê helbestên Baba Tahîrê Hamadanî jê re hatî ye nivîsîn, şewazekê baş û beriz û bilind bû.(Mahdi, Hamad, and Hameed, 2023: 892) Îcar ev e di be belge ku rexne ya edebî ji wî çaxî he bû. Çunku başî û beriz û bilindî ya helbestê belge ye ji bo hebûna rexne ya edebî. Lê belê rexne ya edebî bi pexşan di hê nivîsîn û bi pexşan karê rexne yê “ *Şirovekirin, nirxandin, biryardan* “ di hê kirin. Îcar şirovekirin û nirxandina û biryardan li ser berhemekê edebî bi rê ya helbestê karek pir sehmeye. Herweha avakirina helbestê core sehmetyek dine. Lewre em dikarin bi bêtirîn helbest ne cihê encamdana karê rexne ye eve alîyek û alîyê din helbest xwedî kêş û serwa ye eve di be eger ku zo bi hê ji berkirin û parastin. Lê belê pexşan ne bi wî awayî ye. Lewre helbest ya hatî ye vegohastin û pexşan ya berzebûyî û ne gehîştî ye roja îro. Di encam de eşkere di be ku eger rexne ya edebî ji wî çaxî kevin bi rê ya pexşanê ya berzebûyî û ne gehîştî ye roja îro û ne hatîye parastin. Lew re bi tinê hinek îşaretên rexneyî bi rê ya helbestê gehîştîne roja îro. Îcar ji bo destnîşankirina îşaretên rexne ya destpêkê. Em neçarîn qala hin malkên helbestên helbestvanên kilasîkên kurd bikin û wan malkên helbestê bikin rêyek ji bo peydabûna rexne ya edebî ya ekadimîk(Nihêllî,2010, r.56).

1.4.Melayê Cizîrî û Rexne ya edebî

Bo nimûne di çaxa 16’ an de, Melayê Cizîrî yekemîn helbestvanê kurde, ku peyva “*Rexne*” karanî ye û bi awayekê rind qala vehandina helbestê ji alîyê roxsarê ve dike(Nihêllî, 2010 , r.59). dema dibêje:

*E’hsen ji vê vesfê refî’
Eşkal û ewz’ên bedî’
Têtin ji nûrê wek reqî’
Bê’eyb neqis û rexne da
Ehsen ji vî vezî’ Mela
Eşkal û ewsafên hela*

Lew dil bi wan bû mubtela

Cezbe û celale di sîne da (Doskî , 2007, r.1704)

Di van malkên jûrî de Melayê Cizîrî bi awayekê eşkere peyva rexne weke têgehek karanî ye, lê ji bo mebesta “ *‘eyp û neqis û kêmasîyan* ” karanîye, anku rexne bi şaşî û lawaziyan ve girêda ye. Herweha ji ber şehrezaya Melayê Cizîrî di warê rewanbêjî yê de, giringî bi hûnerên rewanbêjî yê de ye û şêwazê karanîna wê di helbestê de(Nihêllî,2010,r.55).

caran di hê dîtî ku peyva rexne bi awayê “ *Pesinkirin û hêrişkirnê* “ hatîyê derbirîn, bo nimûne Melayê Cizîrî di hin malkên helbestê de, bi harîkarî ya hevberkirinê di navbera xwe û helbestvanên Faris de vî karî encam dide, dema dibêje:

Ger luluiê mensûrê ji nezmê tu dixwazî

Der şîerê Mele bin, te bi Şîrazî çî hacet (Uzun,1992, r. 11).

Di van malkan de Melayê Cizîrî pesna berhemê xwe dike û berhemê Şîrazî (Hafiz, Se’dî) ji berhemê xwe kêmtir dibî ne, anku di vî malkê de dû tiştên giring eşkere dibin weke bi vî awayê jêrî:

- *Melayê Cizîrî rexnê li gelê Kurd digire, ku çavlêkirina biyanîyan neken û beremê kurdî bi xwênin, Çunku berhemê kurdî çî ji yê biyanîyan kêmtir tune ye. Melyê Cizîrî vê yekê eşkere dike ku ji wî çaxî gelê kurd giringî bi zimanê kurdî ne dida, belku giringî bi zimanê biyanîyan di dan.*

Melayê Cizîrî bi rê ya hevberkirina berhemê xwe ji yê Şîrzî (Hafiz, Se’dî) baştir û beriztir dibîne, Anku bi awayek din berhemê xwe bilind dike û yên Şîrazî di şikşne, Îcar eve bi xwe karekê rexn ye(Nihêllî, 2010, r.57).

Herweha Melayê Cizîrî hevberkirina xwe digel helbestvanekê din ê Faris dike ew jî (Frox e), mela xwe baştir ji Feroxî dibîne û wê yekê eşkere dike ku ji feroxî meizin tire û ferox li ser destê min hînbû ye. Îcar erê hûn çima berhemê wî di xwînin û berhemê min naxwînin, îcar werin berhemê min baştire ji yê Feroxî (Amêdî, 2003, r.41),dema dibêje:

Pîrî şe’ar e di şe’rê û melê şalfiroş

Tu nişan min mede Ferxî ku li nik min bû ye ferix(KAYAû NAROZÎ, 1986, r.84)

Anku Melayê Cizîrî xwe baştir dibîne û pesna xwe dike û helbestvanê Faris (Frox)î di şikîne û kêmtir dibîne. Îcar eve xwe karê rexnê ye. Di vir de dû tişt eşkere dibin:

- Melayê Cizîrî rexne li gelê Kurd digire, ku edî bese Çavlêkirina berhemên biyanîyan nekin û berhemên biyanîyan ne xwênin, belku werin berhemê min bi xwênin û berhemê min ji yê Feroxî baştire û min ferox hînkirî ye. Eve di be kakilka rexnê.

- Melayê Cizîrî berhemê Kurîdî ji yê biyanîyan baştir dibîne.

- Herweha giringî yê bi zimanê kurdî dibe û îdî zimanê kurdî bi xwênin.

1.5.Ehmedê Xanî û Rene ya edebî:

Herweha Ehmedê Xanî helbestvanekê dinê Kurde, ku bi rê ya helbestê îşaretên rexne derbirîne. Nemaze di “*Mem û Zînê*” de ku bi awayekê baş qala

rexnê dike. Heta hin rexnegir Ehmedê Xanî bi pêşengê rexna edebî di hesibînin weke Îsedîn Mistefa Resul dibêje: “*Ji bal min Ehmedê Xanî bi despêk a Rexne ya edebî ya kurdî ye*” (Resul, 2008, r. 238) .

Lê belê rexne ya edebî bi awayê pexşankî dihê nivîsandin, nek bi awayê helbest di hê nivîsandin. Lewre em nikarîn Ehmedê Xanî bi despêk a rexne ya edebî bi hesibînin. Îcar emê qala hin malkên Mem û Zîn a Ehmedê Xanî kin, Ku Ehmedê Xanî çawan qala rexne ya edebî kirî ye. Di vî alîyê jêrî de eşkere di be: " Ehmedê Xanî li gorî çaxa xwe bernamêyekê ji bo rexnegiran di dane û rexnegiran dike dû beş: “*rexnegirê baş û rexnegirê xirab*” ji hev cuda dike”(Resul, 2008, r. 235).Herweha daxaz ji xandevanan dike ku bi awayekê hûr û kur ji berhemê wî binêrin û rastîyan eşkerebikin, anku daxaz ji xandevanî kiri ye ku xwandinek berfireh û baş ji bo berhemê wî bi hê kirin. Paşan nixandinek rast û durust ji bo bi hê kirin, helbet ev dibin kakilka rexne ya edebî" (Nihêllî, 2010 , r.60), her weke bi vî awayê jêrî eşkere dibe:

Xelqê ku ji sîne û ji dil saf

Pakîze sirişt û ehlê însaf

Bil cumle bi kin ji bo me tehsîn

Bêjin ku: “ Bi qencî hate tedwîn”(Bozarslan, 1968, r. 75)

Ehmedê Xanî eşkere dike ku serhatî ya Mem û Zînê wesa wê rêk û pêk bikim û binvîsim, ku mirovên dil pak û xwedê însaf hemû eferîne ji me re bikin û bêjin ku ew serhatî çî baş û rind û rêk û pêk vêkxistî û nivîsî ye. Îcar li vir de eşkere dibe ku Ehmedê Xanî pesna xwe dike, li gorî wî çaxî pesin kirin yek ji karên rexne ya edebî bû. Herweha giringî dide yek ji senterên rexne ya edebî ew jî xwendevane. Herweha di van malkên jêrî de Ehmedê Xanî qala hin îşaretên din yên rexne edebî dike, weke xwe kêmkirin, anku bi awayekê din Ehmedê Xanî xwe bi Musteîd dizane, Musteîd Feqehe dereceyekê ji bin melayan re dihên, îcar li vir de Ehmedê Xanî xwe kêmdike û dişkîne û dibêje em hê Feqî me û ne bû me Mela, dibe li nivîsînên min de şaşî hebin. Îcar li vir de Ehmedê Xanî xwe kêmtir ji kesên Mela dibîne, eve bi xwe karekê rexne ya edebî ye. Her weke di vê malka jêrî de eşkere dibe:

Lê hîvî dikem ji misteîdan

Herfan ne girin li mistefîdan

Ev name eger xirabe, ger qeş

Kêşaye digel wê, min du sed renc

Nûbere ye, tîfle, nûresîde

Her çendî nehin qewî guzîde

Lê min ji rezan ne kir temettu’

Manendê dizan bi kin tetebbu’(Osman , 1990, r.67-68)

Anku di van malkên jûrî de eşkere dibe ku Ehmedê Xanî daxwaz ji kesên Mistefîdan û kêsên ku edebê fêmbike dike, ku eger şaşî di berhemên min de hebe ji me re ne girin. Çunku hê Musteîdim û ne gehîştîme pileya here bilinda zanistî. Anku bi awayekê din ev name(Mem û Zîn), Ev pertûkek çî baş be, yan pertûkek xirab be, min gelegî xwe jê re îşandî ye. Eger gelegî baş û sereke

ne be, ew weke Zarokek nû gehiştî ye. Çunku li edebê Kurdî de eve yekemîn pertûke ku bi vî awayî tê nivîsîn, lewre Ehmedî Xanî dibêje ew zarokek nû gehiştî ye (Cîhanî, 2007, r. 280-281), lê belê tişta baş ji vê pertûkê de ku min li nivîsîn û dariştina wê de ji baxê tu kesî wernegirtî ye û min weke dizan ziman, çîrok, serhatî û biwêjên xelkî ji xwe re nekirin mal û min ji rezê xelkî ne dizîn û min serhatî û mijara çîrokî ji bihanîyan wer ne girtî ye. Belku ev çîrok û serhatî ye ji mal û milkê me bi xwe ye, ne yê xelkî ye. Anku bi kurtî ev îşaretên rexne ya edebî di van malkên jûrî de eşkere dibin:

- Rexnegirê baş û xirab ji hev cuda dike.
- Pile ya xwe ya olî kêmîr dibîne ji ya Melayan, Eve bi xwe karekê rexne ya edebî ye.

- Herweha wê yekê eşkere dike ku ev pertûke Mem û Zîn hizir û fikirî wî bi xwe ye. Dizîyên edebî yek ji karên rexne ya edebî bûn ji wî çaxî de.

Herweha di hin malkên din de Ehmedê Xanî daxwaz ji kesên zana û ‘arîfan dike, ku ev pertûke weke zarokek bêguneh û nû gehiştî ye. Îcar eger şaşî û kemasî tê de hebin bi sivkatî rexne ne ken, anku bi awayekê din daxwaz dike ku rexne ya xerab ji me re ne girin. Her weke di vê malka jêrî de eşkere dibe:

Min hîvî ye ji ehlê halan

Teqbîh ne kin evan tevalan (Osman, 1990, r. 67-68)

Anku Ehmedê Xanî eşkere dike eger şaşî û kemasî di pertûka min (Mem û Zînê) de hebe. Di xwaze ku rexne ya xirab ji me re negirin. Îcar li wî çaxî de ev e bi xwe yek ji karên rexne ya edebî bû. Herweha di hin malkên din de qala îşaretên rexne ya edebî dike. Ev pertûka min eger zengîn û balkêş û pir naverok tunebe, guneha min tê tune ye. Na be ji me re rexne ya xireb û sivkatî bi me re bikin, çunku ev pertûka bi zimanê Kurdî nivîsî ye û zimanê kurdî her hin tîra mijara ‘arîfanî dike. Herweha li wî çaxî de nivîsîn bi zimanê kurdî şerim û kemasî bû. Her weke di vê malka jêrî de eşkere dibe:

Ev meywe eger ne abîdare

Kurmancîye, ew qeder li kare

Ev tifle eger ne nazenîne

Nûbare, bi min qewî şêrîne

Ev meywe eger ne pir lezîze

Ev tifle bi min qewî ezîze (Osman, 1990, r. 67-68)

Anku Ehmedê Xanî eşkere dike eger ev meywe *Mem û Zîn* baş, naverokek û balkêş tune be. Gunaha min jê re tune ye. Îcar nabe hûn rexneka sivkatî û xirab ji me re bigirin. Çunku ev pertûke ji ber dilê min re pir şîrîne û weke zarokekê ji me re ezîze û delal e. Herweha di malkek din de wê yekê eşkere dike ku ev delal û mehbûbe bi cil û berigve ya mine û min ji tu kesî bi emanet wernegirtî ye. Anku merema Ehmedê Xanî ewe ku ev pertûke hmû fikir û hizira mine û min ji çi kesî ne dizî ye. Her weke di vê malkê de eşkere dibe:

Mehbûbe, libas û goşîware

Milkêd minin, ne misteare (Bozarslan, 1968, r. 75-76)

Anku Ehmedê Xanî qala dizîyên edebî dike. Îcar li wî çaxî dizîyên edebî hebûn û wî çaxî eve bi xwe karekê rexne ya edebî bû. Ji bal Ehmedê Xanî rexne ya baş û xirab heye, Îcar her kesê taze dest bi nivîsîna helbestê bike, helbet wê şaşî tê de hebin, li vir de nabe hûn rexne ya xirab jê re bigirin, ku bi be eger hîç tiştekê din binvîs e, belku pêwîste rexneka baş û piştevani yê ji re bikin û xebereka xweş jê re bikin, çunku Ehmedê Xanî wê yekê ku Mem û Zîn sehmet jê re bi rî ye û ji fikira kesî ne dizî ye, belku hemû fikira mine bi xwe ye. Îcar li vir de Ehmedê Xanî qala van îşaretê rexne yî dike:

- Rexnegirê baş û xirab ji hev cukirine.
- Qla senterekê rexne ya edebî dike ew jî xanevane.
- Qla dizayên edebî dike, ev jî îşareteka din a rexne ya edebî ye.

Herweha Ehmedê Xanî li cihekê din dibêje:

Ya reb mede dest xelqê nasaz

Vî şahidî dilro bayî tenzaz (Osman, 1990, r.70).

Her weke di malka jûrîn de eşkere dibe ku Ehmedê Xanî peyva *Ya Reb* karanî ye, li vire daxwaz ji xweda yê mezin dike ku berhemê Mem û Zînê neke dest kesên nezan û cahil, ku bi tinê ji şaşîyan bigerin û şikandinê bikin, li vir de ew yek eşkere dibe ku Ehmedê Xanî şanasî yê ji berhemê xwe dike, ku bi awaykê baş û dahênan tê de kirî ye, helbet şanasîkirin jî karek rexneyî ye, Îcar bi awaykê baş her li vir eşkere bû, ku Ehmedî Xanî Rexnegiran dike dû cur:

- Rexnegirê xirab: Rexnegirê xirab ewe ku herdem şikandinê kar di îne û rexne ya wa dibe eger ku îdî nivîskar hîç tiştekê din binvîse.
- Regnegirê baş: Rexnegirê baş ewe ku armanca wan pşxistina edebiyatê ye, bi awyekê baş û durust şaşî yên wan eşkere bikin, ku bi be eger berhemekê baştir binvîse.

Herweha Ehmedê Xanî di hin malkên din de qala îşaretên rexne dike. Di vê malka jûrî de daxwazê ji ‘arif û xwedênasan dike. ku rexneyan jê re ne girin û weke mirovên çavçînûk li dijî min xeber ne den û min şermezar û sivik ne kin. Lê belê kêmasî û şaşîyên min serast bikin. Weke bi vî awayê jêrîn:

Omêd ewe ji ehlê ‘rfan

Ew dê ne girin li min çu herfan

Teşnî’ ne ken wekî xeyûran

Îslah bikin li min qusûran (Cîhanî, 2007, r. 280-281).

Anku li gorî bernmeyê Ehmedê Xanî dû awayê rexne hene, Rexne ya xirab û rexne ya Baş. Îcar Ehmedê Xanî di van malkên jûrî de daxwazê ji kesên zana û xwedê nasan dike ku kêmasî û şaşîyên min serast bikin, neku berhemê min rexne bikin û bi sivik bi hesibînin. Eve bi xwe yek ji karên rexne ya edebî ye. Herweha eger şaşî û kêmasî di Mem û Zînê de hebe, eger ewe ku wî bi xwe xwe perwerdekirî ye û hînkirî ye, her weke di vê malka jêrî de eşkere dibe:

Ez pilewerim ne gewherîme

Xud rusteme ez ne perwerîme

Kurmncim û kûhî û kenarî

Van çend xeberêt kurdewarî (Kurdo, 2009, r.117).

Anku daxwaz û hîvî ya min ji mirovên zana û rêzdar ewe, ku tirane û henek û qeşmerîyên xwe ji mere ne kin, eger min şaşî û kêmasîyek hebe. Ji mere bi borin û şaşîyên min serast bikin. Çunku min bi xwe xwe perwerdekirî ye. Anku bi awayekê din eger ewe ku ez kurdekê çiyayî û dûre bajêrim û bi xwe xwe gîhame û nehatime perwerdekirinê. Ez ji zana û kêsên têgeştî daxaz dikim ku van çend peyvên me yên kurdî bi başî û dilovanîya xwe bi peşrînin, çunku wî çaxî de zimanê Kurdî şerim ‘eyb bû, îcar daxwaz ji kesên zana dike ku nivîsîna Mem û Zînî bi zimanê Kurdî bi şaşî û kêmasî ne hesibînin. Herweha Ehmedê Xanî daxwaz dike ku bi însafî û bê layenî dût ji hevalîni û xizmanî şiroveririnê ji bo berhemê wî bi hê kirin, her weke di vê malkê de eşkere dibe:

Ava rû yê şaîr î ne rê jin

Ger mumkine yêkê qenc bibêjin

Sehu û xeletan nekin te’ccub

Teiwîl bikin ji bo me te’ssub(Cîhanî, 2007, r. 283-284).

Anku Ehmedê Xanî daxwaz ji xwendevanî dike ku bi awayekê baş û bê layenî berhemê min Mem û Zînê bixwînin û şirovebikin û şaşî û kêmasîyan serestbikin dût ji toreyî û te’ssbî yê. Eger berhem baş be. Xeberek baş û qenc ji me re bi bêjîj û eger şaşî û kêmasî di berhemê min de hebin ji mere biborînin û şaşîyên min ji me re serastbikin, Anku bi kurtî ev îşaretên rexne di malka jûrî de eşkere dibin. Her weke bi vî awayê jêrî:

- Giringî bi alîyê rexne ya edebî dide, ew jî xwendevane.

- Herweha daxwaz ji rexnagiran dike bi awayekê bê layen dût ji hevalîni karê rexneyî encam bidin.

Herweha daxwaz dike ku şaşî û kêmasîyan bi şaşî ne hesibînin. Belku di vê karê rexnê bi şirovekirin û bi hê encam dan, anku daxwaz dike şrovekirineka hûr û kûr ji bi berhemê wî bi hê kirin, Helbet eve ek ji karên rexne edebî ye.

Herweha Ehmedê Xanî di hin malkên din de pesna sê helbestvanên pêş xwe dike, îcar pesn kirin bi xwe yek ji karên rexne ya edebî ye, dema di bêje:

Min dê elema kelamê mewzûn

Alî bikira li banê gerdûn

Bînave rihê Melê Cizîrî

Pê hey bikira Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqîhê Teyran

Hetta bi ebed bi mayî heyran(Adak, 2014,r.231)

Herweha Ehmedê Xanî qala avakirina têtista helbestê dike, anku ji bal Xanî helbesta baş pêwîste bi awayekê kurt û xwedî wata be û nabe helbest bi awayekê dirêj û peyvên bê wate tê de bi hê kar anîn, her weke di vê malkê de eşkere di be:

Ey xame te gelek dirêj kir

Ev name te pir qirêj kir

Her çendî kelam şibhê dur bit

Bê qedir di bit, dema ku pir bit”(Bozarslan, 1968, r. 482).

Anku Ehmedê Xanî rexnê ji xamê xwe digire û eşkere dike ku nabe hemû fikir bê nivîsîn, belku pêwîste ew nivîsîn kurt û xwedî wate be.

Weşanxane çaxê 15' an li Ewropa derdikeve holê. Di dawî ya heman çax de bi destên penaberên Cihî û Îspanî di gehe Sitenbolê. Paşî Erman û Rum ji xwe re weşanxanên xwe avadikin(ARSLAN, 2014, r. 12).

1.4. Kurtîyek li Ser Rewş a Rexne ya edebî li Bkûrê Kurdistanê ji Şerê Yekemî Cîhanî heta 2010:

Pêşî dîroka Şerê Yekemî Cîhanî li bin saya Osmanîyan çendîn rojname û kovar derketin holê weke kurdistan(1908), Şerek we Kurdistan, ev kovarin : " Roja Kurd (1913), Hetawî kurd(1914)*lê belê di wan rojname û kovaran de tu lêkolînên edebî ji pêş çavên me neketî ne. Lewre ji bo cara yekemîn ku lêkolîn hatbin dîtîn di rojnama, ku lêkolînek li ser tê de tune bûn.Eger em bixwazin dîroka weşanxana kurdî dabeş bikin, dikarin ji rojnameya Kurdistanê (1898) heta Meşrûtiyeta Duyem dewra destpêkê; ji RAPKê (1908) heta Hetawî Kurdê (1914) dewra yekem bihesibênin" Zebari, R. I. K. & Babayiğit,2021, r.54). Piştî Şerê Cîhanî êdî dewreke nû dest pê dike. Di vê dewra nû de kovarên bi navê *Jîn û Kurdistan** tene weşandin. Ew jî weke selefên xwe pîrzanî/zaravayî ne (kurmançî-soranî, tirkîya osmanî, car caran 'erebî û farisî) lê vegotina wan cuda ye. Ew şeweya RAPKê ya helîm, vegotina îslamî ya Rojî Kurdê li paş dimîne, Lewre rewşeke giran a siyasî li ber rewşenbîrên vê dewrê heye: Împaratoriya kal ku heta niha kurdan zik û pişt parastina wê dikir belav dibe û kurd ji bo çarenûsa xwe hewce ye biryareke dîrokî bidin. Rexne ya edebî piştî çaxê şerê cîhanî ê Yekem di pexşanê de eşkere dibe. Çunku di vî çaxî de Mem û Zîna Ehmedê Xanî 1919'an de li Sitenbûlê di hê weşandin. Îcar Hemzeyê Muksî pêşgotinekê jê re nivîsandî ye, weha gotî ye :

"Jibo her gelek û neteweyek, bêje û eserên bêjeyî wek hîmên zexm in jibo koşkên bilind. Neteweyê xwedîbêje çi qas kêr bikeve û koşka karîna wî ya maddî biherive jî, dîsa bi hîmmetek tê tamîrkerin.... herweha Li gora vê rastîyê, hemî gel û neteweyên ku daxwaza hebûn û karîna xwe ya neteweyî bikin, divê ku ji despêkê ve giringîyeka xurt bidin bêjeyên xwe û eserên xwe yê bêjeyî. Hezretî Ehmedê Xanî, berî çar sedsalan ev rastî dîtî- ye û jibo wê xebitîye Ew dibêje ku min zimanê Kurdî anîye nîzam û A A A intizame:

*Kovara *Hetawî Kurd*, ev kovar herî kêr 10 hejmar derketîne holê. Lê belê di destê me de hejmarên wê ên 1, 2, 3, 4, 5 û 10 hene. Ji ber şerç Cîhanî yê Yekem mecbur dimîne, ku weşana xwe bi sekîne.

*Jîn, kovareke kurdî-tirkî ye ku di navbera salên 1918-1919an de li Stembolê bi giştî bîst û pênc hejmar hatiye weşandin. tê weşandin, di dawîya vê bernameyê de jî tê gotin ku Berpirsiyariya Jînê Hemzeyê Muksî (bîst hejmarên ewil) û Memdûh Selîmbegî (pênc hejmarên dawî) kiriye.

*Da xelq nebêjîtin ku Ekrad
bême'rifet in, bêesl û binyad
Xasma di vê sedsalê da, di cîhana medenîyetê da delîl û berata neteweyan
ziman û bêjeya wan e Neteweyê ku bêdelîl û bêberat be doza wî nayê bihistin,
kes guhê xwe nade wî"* (Bozarslan, 1985, r. 65- 66)

Tarîxa pêşgotina Hemze 3/5/(1919) e Ew pêşe peyv hem di sere Mem û Zîn ê de hatî ye weşandin. Hem di hejmareka Jîn ê de derketî ye" (Bozarslan, 1985, r.66).

Beşa Kurdistanê ya herî dawî ku li ser çavkanî ên dîroka wêjeya Kurdî berhem dane, beşa bakûr e. Sedema vê direngbûn û valahîyê ew bû, ku piştî damezrandina komarê li vê beşa Kurdistanê li ser çand û zimanê kurdî qedexeyeka wisa hebû ku li tu derê cîhanê ne heye û ne hatî ye ne jî hatî ye dîtîn. Vê qedexeyê heta sala 1990'î hespê xwe divê beşa welatî de ajot. Lê belê piştî ku qedexe rabû wêjevan û nivîskarên kurdan serê xwe di bin kurk û ebayên re derxistin û zind û bendên xwe heldan û dest avêtin pênusên xwe û berhemên hêja li ser çavkanîyên dîroka edeba kurdî derxistin holê (Ocak, 2014, r.40). Îcar di van pertûkan de qala rexne ya edebî jî hatî kirin Hin ji wan çavkanîyan re ev in:

Bwerhema A.Balî “*Antolijya Helbestvanên Kurd*“, di sala 1992'an de ji aliyê weşanên Pelê Sor li bajêrê Stenbolê hatîye çapkirin.

Berhema Mehmed Uzun, a bi navê “*Antolojîya Edebiyata Kurdî*“, di sala 1995'an de ji aliyên weşanên Aram ve li bajêrê Stenbolê hatîye çapkirin.

Berhema Feqî Huseyîn Sagniç a bi navê “*Dîroka Wêjeya Kurdî*“, di sala 2002'an de ji aliyê weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve li bajêrê Stenbolê hatîye çapkirin.

Berhema Selîm Temo, ya bi navê “*Kurd Şîrî Antolojîsî*“ ji alî weşanên Agorayê ve di sala 2007'an de li Stenbolê hatîye çapkirin¹.

Encam

Destpêka edebiyata kurdî weke her gelekê din ji edebê folklorî destpêdike(Mehemed, 1989, r. 160). Îcar ji bo vê yekê hin îşaretên rexneyî di gotinên *pêşyan*, *beyit*, *sitrân û serhatiyan* de eşkere dibin. Lê belê rexne li ser berhemê nivîsî di hê kirin. Lew re em nikarîn wan îşaretên rexne weke despêkek ji bo rexne ya edebî ya kurdî bi hesibînîn

Reh û kokên dîroka rexneya edebî li Bakûr, ji bo helbesta kilasîk a kurdî dizivire. Çunkî îşaretên rexneya edebî di helbestên klasîk de dihên dîtîn. Reh û kokên rexneya edebî di nava edebê kurdî de ji bo çaxê 16an vedgerê.

Melaê Cizîrî helbestvan di çaxa 16' an de, Melayê Cizîrî yekemîn helbestvanê kurde, ku peyva “*Rexne*” karanî ye û bi awayekê rind qala vehandina helbestê ji aliyê roxsarê ve dike

*E'hsen ji vê vesfê refî'
Eşkal û ewz'ên bedî'*

¹ Nezîr Ocak, Edebiyata Kurdî, r. 40

*Têtin ji nûrê wek reqî'
Bê'eyb neqis û rexne da
Ehsen ji vî vezî' Mela
Eşkal û ewsafên hela
Lew dil bi wan bû mubtela
Cezbe û celale di sine da*

Di van malkên jûrî de Melayê Cizîrî bi awayekê eşkere peyva rexne weke têgehek karanî ye, lê ji bo mebesta “ ‘eyb û neqis û kêmasîyan ” karanîye, anku rexne bi şaşî û lawaziyan ve girêda ye.

Reh û kokên rexne ya edebî di nava edebê kurdî de ji bo cara yekem ji bo çaxê 16'an Melayê Cizîrî diziv re. Çunku Melayê Cizîrî Yekemîn helbestvanê Kurde, ku peyva “ rexne ” di helbesta xwe de kar anî ye.

Beşa Kurdistanê ya herî dawî ku li ser çavkanî ên dîroka wêjeya Kurdî berhem dane, beşa bakûr e. Sedema vê direngbûn û valahîyê ew bû, ku piştî damezrandina komarê li vê beşa Kurdistanê li ser çand û zimanê kurdî qedexeyeka wisa hebû ku li tu derê cîhanê ne heye û ne hatî ye ne jî hatî ye dîtîn. Vê qedexeyê heta sala 1990'î hespê xwe divê beşa welatî de ajot. Lê belê piştî ku qedexe rabû wêjevan û nivîskarên kurdan serê xwe di bin kurk û ebayên re derxistin û zind û bendên xwe heldan û dest avêtin pênusên xwe û berhemên hêja li ser çavkanîyên dîroka edeba kurdî derxistin holê.

Herweha rexnegirên me kesianên şehreza û pispor tunebûn. Belku helbestvane û karê rexnê dike.

Çavkanî

- Adak, A. (2014), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Kilasîk*, Weş. Nûbihar, Ç.2ê, Îstanbul.
- Amêdî, E.Y.(2003), *Peydabûnê Rexneyî Edebî le Şî'rî Kilasîkî Kurdî ta Cengî Gêtî Cîhan*, Ji weşanên Belawkirawî Aras, Weş. Wezaretî Perwerde, Hewlêr.
- ARSLAN, M. (2014), *Di dewra Osmanyên de weşangehiya kitêbên Kurdî*, Z. Mardîn Artukluyê, Enstutuya Zimanên Zîndî li Turkiya yê, T. Lîsansa Biind, Mardîn.
- BozarSlan, E.B.(1985), *Komkirina K. Jîn*, Weş. Deng, C. 1ê Siwîd.
- BozarSlan, M. E.(1990) , *Mem û Zîn a Ehmedê Xanî*, Gün Yayinlari, Îstanbul, 1968.
- Cîhanî, P. (2007), *Mem û Zîna Ehmedê Xanî(Bi rave û Şiroveyek nû)*, B. 1ê, Ji weşanên Dezgehê Spîrêz, Weş. Xanî, Duhok.
- Cuqî, Î. N.(2016). *Şî'r û Mêjû*, Ji weşanên dezgehê Sipîrêz, Weş. Matris, Turkîye.
- Doskî, M. E.(2007), *Şirovekirin a Dîwan a Melayê Cizîrî*, B. 4, Ji Weşanên Dezgehê Sipîrêz, Weş. Hecî Haşim, Hewlêr, Ç. Yekê.
- Ebdulrehman, F. (2014). *Çemkî Felsefeyê lêgdanewegerayî le Rexney Edebî da*, K. Nuser, J.10, Weş. YNK-Silêmanî, Silêmanî.

- Ehmed, H. S. (2009). *Rehendî Rexney komelayetî le Şî'rekanî Hacî Qadir û Bêkes da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, Hewlêr.
- Gerdî, E. (1974). *Rexne û Edeb*, Weş. El- Hewads, Ç.1ê, Bexd.
- Hamad, H. K. (2018). Sovereign Immunity and Its Development in International Law. QALAAI ZANIST JOURNAL, 3(1), 1113-1129.
- Hamad, H.K., 2024. The Philosophy of Contract between Theory and Practice. Pakistan Journal of Humanities and Social Sciences, 12(2), pp.935-942.
- Kurdo, Q. (2009), *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, weş. Lîs, Ç. 3ê, Amed, 2009.
- Mahdi, L. D. M. H., Hamad, L. H. K., & Hameed, L. H. A. (2022). Preventive Methods of Administration in Protecting the Environment from Pollution-Comparative Legal Study. Journal of Juridical and Political Science, 11(2).
- Mahdi, M. H., Hamad, H. K., & Hameed, H. A. (2023). The Role of The Environmental Observer and The Environmental Police in Protecting the Environment in Iraqi Law: Comparative Legal Study. QALAAI ZANIST JOURNAL, 8(3), 889-910.
- Mehemed, M. D. E. (1989), *Rolê kovara Gelawêj di geşesendin û pêşxistinî Edebî Kurdî da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.
- Nihêllî, N. H. (2010), *Deravek ji Rexnê (Rexne û Vekolîn)*, Weş. Hawar, Ç.1ê, Duhok.
- Ocak, N. (2014), *Edebiyata Kurdî*, weş. Sêtav, Wan –Türkiye, 2014
- Osman, Mehemed. E. (1990), *Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Weş. El- Cahiz, Ç. 1ê, Bexdad, 1990.
- Qadir, R. X. (2009). *Mêtodî Rexney Tewawkarî (El-Tekamîlî) le Rexney Edebî Kurdî da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.
- Resul, Î. M. (2008), *Ehmedê Xanî Şa'îr û Bîrmend û Feylesof û sofî*, wer: Nivîskar bi xwe, Weş. Weşanên Hemdî, Silêmanî, 2008.
- Salih, A. K. (2010). *Rexney komelayetî û Piraktîzekirdinî le Şî'rîekanî Goranda*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.
- Uzun, Mehmed (1992), *Despêka Edebiyata Kurdî*, weş. Beybûn, Ç. 1ê, Ankara, 1992.
- Zaynelabidin KAYA û M. Emîn NAROZÎ (1986), *Diwana Melayê Cizîrî*, weş. Roja Nû, Stockholm, Sweden.
- Zebari, R. I. K., HUSEEIN. B. R., ABDULRAHMAN. L. M., AMEEN, S. T. M. (2022). *LÊKOLÎNEK LI SER ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ*, Kurdiname, No: 7, R. 128
- Zebari, R. I. K. & Babayiğit, M. V. (2021a). *KÜRT GAZETECİLİĞİN EDEBİYAT ELEŞTİRİSİ ÜZERİNE ETKİSİ: 1991-2003 GÜNEY IRAK ÖRNEĞİ*. Mesopotamia Journal of Interdisciplinary Studies, 1(1), 68-76. DOI: 10.29228/mjis.54692.

- Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2021b). *Peyv" Dergisinin Çeşitli Metinlerinde Edebi Eleştirilerin İncelenmesi*, Cihanşümül Akademi Sosyal Bilimler Dergisi, 2 (3), 1-33.
- Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2022). *Dîrok a Rexne ya Edebî ya Kurdî li Başûr*. Kadim Hikmet Uluslararası Bilimler Dergisi, 6, 28-44.
- Zebari, R. I. K. & Babayiğit, V. (2022). *Diroka Rexne ya Kurdi li Rojova*. Mesopotamia Journal of Interdisciplinary Studies, 2(2), 102-109. DOI: <http://dx.doi.org/10.29228/mjis.66398>